Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 43
15'ê July 2006
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

Li Viyenayê meş
Kurdan xwest dosya teror dijî Dr. Qasimlo û hevalên wî derkeve rojevê

Roja 13.07.2006'an, 17'emîn salvegera terora dijî Dr. Qasimlo û hevalên wî bû. Kurdan li hember bîroya Serok Wezîrê Otrîşê meşeke berfireh û mezin pêk anîn û xwestin dosya teror a dijî Dr. Qasimlo û hevalên wî ji aliyê vê dewletê ve derkeve rojevê..... **Rûpela 6**

Kurdan Di 17'emîn Salvegera Şehîdkirina Dr. Qasimlo û Hevalên Wî De

TEROR Û TERORÎSTPERWERİYA DEWLETA ÎRANÊ ŞERMEZAR KİRİN

Ji bo nîşandana nerazîbûnê û şermezarkirina terora dewletî ya rejîma Îslamî a Îranê û yek ji wan terora hov û nemirovane ya Dr. Qasimlo û hevalên wî li ser maseya gotûbêjê di 13.07.1989'an de, xebat û çalakiyên şermezarkirinê li bajarên Kurdistana Îranê û derveyî welat bi xurtî meşiyan. Li piraniya bajarên Kurdistanê gel ji daxwaza PDK Îranê ji bo xuyakirina nerazîbûn û şermezarkirina terora dijî Dr. Qasimlo û hevalên wî ji aliyê dewleta Îslamî a Îranê xwedî derketin. Li piraniya bajarên mezin yên Ewropa û Waşîngtonê meş û xebatên şermezarkirinê li hember Balyozxaneyên rejîma Îranê û Parlemanên welatên Ewropayê hatin lidarxistin.

Siyasî R. 6

Wêne - Mehabad: Daxistina tev dikan û bazarên bajar di 17'emîn salvegera şehîdkirina rêberê nemir Dr. Qasimlo û hevalên wî Wêneyên pêtir li ser malpera me bibînin

17'emîn Salvegera Terora Dijî Dr. Qasimlo Û Hevalên Wî Li Binkeya Deftera Siyasî Hate Bibîranîn

Roja pêncşem, 22.04.1385 (13.07.2006)'an, 17'emîn salvegera terora dijî şehîdê mezin Dr. Qasimloyê nemir û hevrêyên wî, rê û resmeke hêja û berfireh bi beşdarbûna tev endamên rêberî, Kadro û Pêşmerge yên PDK Îranê li binkeya Deftera Siyasî a vê partiyê birêve çû.

Rê û resmê bi xwendina marşa nîştîmanî a "Ey Reqîb"ê dest pê kir û piştre kurte fîlmek ku ji aliyê Beşa fîlm ve li ser kesaytetiya siyasî a Dr. Qasimlo û bîr û hizra hin kesayetiyên siyasî û wêjeyî ên Kurd li ser wî rêberê mezin, hatibû amade kirin, pêşkêş beşdaran bû.

Di parek din a rê û resmê de birêz Mistefa Mewlûdî, Endamê Deftera Siyasî a PDK Îranê gotarek li ser raman û kesayetiya Dr. Qasimlo pêşkêş kir û di gotara xwe de jî rêz ji bîranîna birêz Seyîd Selam Ezîzî yê nemir, endamê pêşîn ê Deftera Siyasî a PDK Îranê girtibû.

Li doma rê û resma han de bi awayê kors du sirûd ji

aliyê koma hunerî a PDK Îranê û miqamek ji aliyê birêz Bêhruz Lutfî ve, bi hinceta ji destdayîna rêberê mezin û zana yê Kurd Dr. Qasimlo hatin pêşkêş kirin û her di vê derheqê de jî helbestvanan: Şerîf Felah, Cemal Necarî û xatûna Trûske, hestên bi kul û keser ên xwe di çend parçe helbestan de anîn ziman.

Di dawiya rê û resmê de ji aliyê koma hunerî bi awayê kors sirûdek hat pêşkêş kirin.

Qasimlo Bîrmendeke Şoreşvan Û Aştîxwaz



Siyasî R. 4-6

Deqa Axavtina Birêz Mistefa Mewlûdî, Endamê Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Di Rê Û Resma 17'emîn Salvegera Şehîdbûna Dr. Qaimlo Û Hevalên Wî de

Siyasî R. 2

TÊGIHÊN FELSEFÎ

Çand R. 10

Jin Di Yekemîn Ceribîna Hilbijartina Kuweytê De

R. 7

Serdemê Bav Serdestiyê

R. 8

"ŞÎROVEYA DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ" DERKET

R. 11

Deqa Axavtina Birêz Mistefa Mewlûdî, Endamê Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Di Rê Û Resma 17'emîn Salvegera Şehîdbûna Dr. Qaimlo Û Hevalên Wî de

Hevalên xweştevî!
Xûşk û birayên hêja!

Ez îznê dixwazim bi nûneriya Deftera Siyasî ya PDK Îranê bixêrhatina beşdarên qedirgiran yên vê rê û resma bibîranînê bikim ku ji bo rêzgirtin ji bibîranîna şehîdê nemir Dr. Ebdulrehman Qasimlo, rêberê leheng û zana yê PDK Îranê pêk hatiye.

Îro bi hinceta borîna 17 salan ji ser terora dijî rêberê leheng û payebilind yê Partiya Demokrat, dîplomat û siyasetvanê navdar yê Kurd, Dr. Qasimloyê nemir û 7 saliya wexera dawî ya ne biwext ya xebatkarê sozdar yê PDK Îranê, kekê Seyîd Selam Ezîzî, endamê Deftera Siyasî ya partiya me ye ku di roja 24'ê Pûşpera 1378'ê Rojî (15.07.1999) bo cara dawiyê xatira xwe ji hevçeper, gel, welat û malbata xwe ya hêja xwest, em li dora hev civiyane. Beşdariya we di vê rê û resmê de rêzdanîna we ji bo wê rola giring û bibandor diyar dike ku her du wan ezîzan û nemaze mamostayê me yê nemir Dr. Qasimlo di berbipêşde birina xebata gel û partiyê de dilîstin.

Hevalên rêzdar!

Gelê Kurd û piraniya zaf ya xebatkarên siyasî û ronakbîr yên herêmê û gelek ji siyasetvanên cîhanê ku li pey pirsên siyasî di Rojhilata Navîn de digeriyan, kêm û zêde Dr. Qasimlo naskiribûn û rolê wî mêrê mezin di guhertinên siyasî ên herêmê de fêm kiribûn. Bi taybet em şagird û hevçeperên Dr. Qasimlo, piranî ji nêzîk ve yan bi sedema bidestxistina nivîsarên wî, her kes ji me li gor xwe şarezayiya nisbî li ser rolê wî mamostayê payebilind heye. Heke em ji wêje û nivîsarên PDK Îranê re binêrin, em dibînin ku di piraniya herî zaf ya war û astan de bi dîtin, bîr û ramanên wî mirovê mezin hatiye zengînkirin û PDK Îranê û tevgera Kurd bi giştî sûd û feydeyeke zaf ji bîr, fikr û ramanên wî rêberê payebilind wergirtiye.

Di heyamê wan 17 salan de ku mixabin bi cendek di nava me de nemaye, di salvegera ji dayîkbûn yan şehîdbûna wî de û bi bone û hincetên cuda cuda ve, me gelek li ser jiyana siyasî û çawaniya tevlîbûn bi xebata siyasî û xwendin û rolê wî di rêberîkirina PDK Îranê de axiviye û nivîsandiye.

Li vir em çiqas li ser wî binivîsînin, nikarin ji vê çendê pêtir bibêjin ku hetanî niha li ser de hatiye gotin û nivîsandin. Aliyê kêm eva ku ne di şiyan û karîna min de ye ez tiştek pêtir bixim ser basa dîroka tejî ji tekoşîn û serfirazî û serbilindiyên wî rêberê mezin yê zana û siyasî.

Lewre ez rêyê dixwazim ku tenê min lênihêrîneke dubare bi ser wan tiştan de hebe ku heya niha li ser Dr. Qasimlo hatine gotin û nivîsandin û ez parek ji nêrîn û ramanên wî careke din bixim ber bal û raya we ezîzan ku bûne xet û nîşan ji bo partiyê û xebatkarên PDK Îranê û ew tiştên ku di serdemê niha de girîngtir û hewcehiya wan zêdetir e, heke derfet hebe em pêtir li ser wan rawestin û bidin şirove kirin.

Siyasetvanên gelê Kurd bi giştî û nemaze endamên PDK Îranê dizanin ku Dr. Qasimlo xebata xwe ya siyasî bi endambûn di refên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ya Kurdistana Îranê de dest pê kiriye, ew rêxistina ku li serdemê avabûna Komara Kurdistanê hetanî niha jî mil bi milê tekoşîna vê partiyê xebata siyasî û senfî ya xwe domandiye û ji bo piştevanî ji siyasetên PDK Îranê hezaran ciwan perwerde û elimandine û bi dehan û sedan kes ji wan bûn bi endamê PDK Îranê û rola çeleng û baş di jordeçûna tevgera Kurd û birêvebirina erk û xebatên vê partiyê de hebûye.

Dr. Qasimlo piştî hiloşîna Komara Kurdistanê yek ji wan kesan bûye ku ji destpêkirina xebata nepenî ya partiyê de rol hebûye û bi taybet di refa pêşîn ya wan kesan de bûye ku sala 1334 (1955)'an ji bo serbixwe kirina rêxistina Partiya Demokrat kar kiriye û xebitiye.

Rolê Dr. Qasimloyê rêber wê demê pêtir diyar û berçav dibe ku sala 1349'an ya Rojî, piştî derçûna daxuyaniya 11'ê Adara sala 1970'an ya Zayînî li pey bi fermî nasîna Otonomî bo Kurdistana Îraqê, vedigere Îraqê. Di wî çaxî de ku mixabin Partiya Demokrat rastî gelek pirsgirêkan bûye ku bi micid li destê wan nalandiye, Duktor wekî hekîm û mamostayeke jêhatî bi alîkariya xebatkarên dilsoj yên din ên partiyê ji wê delîveya hêja ku wê demê derketibû holê, mifah stand û bi dunyayek ceribandin û derbazbûyiya siyasî û deryayek ji zanist û hûrbînî û radeyeke bêwêne ji têkiliya kesîne, siyasî û zanistî tevî kesayetî û kom û komeleyên Kurd, Îranî û biyanî hewl û cehda bêrawestan daye ji bo saxkirin û zindîkirina rêxistinên partiyê.

Bi gotina wan kesên ku wî çaxî şanaziya hevxebatbûn tevî Dr. Qasimlo hebûne, Dr. Qasimlo di vê dewranê de Ronesans di nava PDK Îranê de pêk aniye û canek taze daye peykerê nîve can yê partiyê û ew jî ji ber çend sedeman bû. Berî hemû tiştekê ji ber vê çendê ku kesayetî, nav û nasnav û rewşa wî ji bo hemû deste, girûp û baskên nava partiyê cihê qebûlê bûye.

Piştre jî ji ber vê çendê ye ku bi hewsele û hekîmane tevî hemûyan û heta bi neyarên xwe ên herî tund jî hewil daye li dora armanc û bernameyekê kom bibin û ji tevan girîngtir rêyek jî ku Dr. Qasimlo xistiye ber ra û bala xebatkarên demokrat, ne tiştek bûye ji bilî wê rêbazê ku ji

Birêz Mistefa Mewlûdî

destpêkê ve bi destê bihêz û xwedî şiyan yê Pêşewayê Şehîd, Qazî Mihemed nexşê wê hatibû kêşandin û rengê wê jî rijiyabû.

Di wî serdemî de hebûna Dr. Qasimlo di hemû waran de liqîneke mezin ji Partiya Demokrat re daye. Di heyameke kurt de partî bûye xwediyê rêxistin, bername û pêrew, rojnameya organî û ji hemûyan giringtir biryara xwe ya siyasî. Dr. Qasimlo xebatkarên Demokrat hînî gelek tiştan kirine ku niha jî çirayê rênîşan yê rêya xebata me ne.

Wekî: parastina ûsil û qeîdeyên partiyê, ser û berî û dîspilîn, bawerî bi xwe hebûn, bawerî bi girîngiya teşkîlatî, bihadana herçiqas pêtir bi têkiliya berfireh û zindî bi civatên xelkê re, liberçavgirtina qazancê mezin yê netewî û nîştimanî û gorîkirina bidestxistiyên biçûk di rêya parastina destketinên mezin û vêca giştî de. Ji tevan girîngtir Dr. Qasimlo gelek nirx û biha bi azadî, keramet û kesayetiya mirovan daye. Lewre digot: **"Di cîhanê de tu nemetek ji azadiyê binirxtir nine. Azadî keramet û kesayetiyê dide mirov û rêyê nade bibe bi mohre. Divêt mirov ji haletê mohrebûnê bihê der, bibe kesayetî, bibe kesek zindî û çeleng ya/ê civakê**."

Bi awayekî giştî Dr. Qasimlo rêberek xwedî şiyan, şiyar, zîrek û karjêhatî bû. Ew di gelek warên jiyana siyasî û civakî de bêwêne bû, Şoreşvan û Pêşmergeyê çiya û ronakbîr û nivîskar û darêjerê siyasetên giştî ên partiyê bûye ku ji me re rênîşander bûn.

Dr. Qasimlo li hundir rêberek xelkî û popoler û li dunyaya derve dîplomatek şareza, pispor û jêhatî bû. Gelek kesên biyanî li ser kesayetiya siyasî û karîna dîplomasiya Dr. Qasimlo nivîsandine.

Li vir em dê tenê mînakekê bînin. **Canatan Rendal**, rojnamevanê mezin

yê Amerîkayî, dibêje:"Qasimlo take rêberê Kurd bû ku dikarî bi lêhatîbûn û biwêrî ve tevî dewletekê bikeve gotûbêj û danûstandineke serbilindane. Şiûra siyasî û têkiliyên bi siyasetvan û rojnamevanên Ewropî û yên din re wareke zanistî bi kesayetiya Qasimlo dabû ku li tu kesayetiyeke din yê/a Kurd nedabû." Piştre dibêje: "**Gelek Kurd li ser vê baweriyê ne, heke Dr. Qasimlo niha maba, dikarî karê hemû Kurdan ber bi pêş bibe**".

Hemû ev xisletane û gelek taybetmendiyên din ên Dr. Qasimlo bibûn sedema vê çendê ku Komara Îslamî, dijminê kîndar yê gelê Kurd û Partiya Demokrat, kerb û kîneke kevneperestane ya kûr ji Qasimlo hebe û hemû rêyan bo ji nav birina wî bigre pêş. Ewa bû ku mixabin ji seha aştîxwazane ya Dr. Qasimlo mifaha nebaş wergirt û bi wî awayê ku em hemû haydar in, komployek jê re hate darêtin û di roja 13.07.1989'an de li bajarê Viyan, paytexta Otrîşê bi destê terorîstên Komara Îslamî hate şehîd kirin.

Di rastî de rejîmê dixwast bi ji nav birina Dr. Qasimlo, PDK Îranê ji holê rake, lewra jî nîşane li serê partiyê girtibû. Lê rayedarên Îranê hesab ji bo roleke gelek bingehîn di karê rêberiya Dr. Qasimlo de nekiribû. Ew jî eva ku Duktor hergav hewil dida rolê takekesî di nava partiyê de biçûk bihê kirin û bihayê bi karê bikom û eqlê bikom û rêberiya bikom bihê dayîn. Bi taybetî ew hizr, raman û rênîşandanên ku li paş xwe ji bo partiyê û xebatkarên Demokrat bicî hêlane, heke xwendineke dirust li ser bihê kirin û her yek ji wan di cihê xwe de mifah jê bihê standin, nek terorkirina kesayetiyeke weke Dr. Qasimlo, belkî hemû pîlan û komplo dijî Partiya Qasimloyê mamosta û rêber dê vala û pûç bibin.

Gelî hevalan:

Dr. Qasimlo bi gotinên xwe ên bi nirx û şîretên mamostayane gelek xet û nîşanên dirust ji me re darêtine ku heke xebatkarên Demokrat û şagirdên Qasimlo bi başî hîn bibin û li cihê hewce jê sûd û faydeyê werbigirin - ku ez di karîna xebatkarên partiyê de dibînim – ez piştrast im ku tu demekê gelê Kurd rastî bêhêvîtiyê nabe û şagirdên Qasimlo nasekinin û bi mifah wergirtin bi ceribandin û şiyana siyasî û hizrî ya Mamostayê xwe rêya çareseriya tev pirsgirêkan dê peyda bikin.

Dr. Qasimlo di gotinên xwe ên bihagiran de gelek micid tekez li ser vê çendê dikir ku heke gelek azadîxwaz be, divêt nirxa vê azadiyê jî bide. Xebat dijî zilm û zordariyê ji bo Dr. Qasaimlo pirseke bingehîn bû. Di hevpeyvîn tevî Bêhroz Yûsifzade de dibêje: "**Pirseke bingehîn ji bo min ku her ji destpêka ciwaniyê min jê re xebat kiriye, pirsa ji nav birina stem û zordariyê bûye**. "Baweriyeke kûr û kemilî bi demokrasiyê hebûye û ji bo cihgirkirina demokrasiyê di nava rêxistina partiyê de xebat kiriye. Di tu demekê de bihaya demokrasiyê li ber çavê wî ne kêmreng bûye û demokrasî weke take zamin û garantiya dabînkirina maf û azadiyan hesibandiye. Lewra gelek bi eşkere dibêje: "**Min demokrasiya herî xirab ji dîktatoriya herî baş pê çêtir e**."

Gelek xurt dijî dîktatorî, raman û bîra dîktatorî û takekesperestiyê sekinî ye û derheq yekîtiya siyasî û fikrî de dibêje: "Xurtkirina yekîtiya siyasî û fikrî erkeke bingehîn e ku dikeve ser milê tev endamên partiyê. Xuya ye giştî endamên partiyê derbarê pirsên siyasî wekî hev nafikirin, armanc jî ne eva ye ku wekî hev bifikirin. Ji ber ku eva ne mumkin e û ne jî bi qazanc û berjewendiyê tekoşîn û xebata partiyê

Dîmenek ji beşdarên rê û resma 17'emîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî di binkeya Deftera Siyasi ya PDK Îranê de

ye, merem ji vê yekîtiyê ne standina afirandina fikrî ji endamên partiyê ye. Hebûna bîr û rayên cuda û li hevkirina demokratîk ya wan kilîta çareserkirina rast ya arîşe û pirsgirêkan e û sedema ber bi pêşde çûna partiyê ye."

Bi nêrîna Dr. Qasimlo bi giştî awayê herî baş yê rêveberiyê di partiya me de têkiliyên zindî, rênimayî û di encam de têgihîjandin e.

Dr. Qasimlo teror wekî kiryareke biyom û dijî mirovane dizanî û teror li her cihekê û bi her merem û awayekê biba, şermezar dikir. Di rastî de Dr. Qasimlo sinc anî nava siyasetê û serxwebûna biryara siyasî ji bo PDK Îranê ji hemû tiştеke din zêdetir hez kiriye. Ji bo derbazkirina rêxistina partiyê ji girêdayîbûn bi rêxistinên din, gelek kar û xebat kiriye. Tu demekê delîve û fersend nedaye ku serxwebûna partiyê bikeve xeterê.

Ezîzino!

Tevî bibîranîna mamostayê me yê mezin, cihê xwe ye ku em yek ji xebatkarên sozdar yê PDK Îranê bibîr bînin, ku di roja 15.07.1999'an bo cara dawiyê xatira xwe ji me xwast. Nemir kekê Seyîd Selam Ezîzî ku 7 salan berî niha di çaxeke bêwext û di rewşekê de ku partî û gelê wî ji giştî demekê pitir hewcehî pê hebû, destê ecelê ji me stand.

Kekê Selam ew mirovê xudan îman û berxweder bû ku di sala 1979'an têkilî bi Partiya Demokrat ya Kurdistanê ve girt û ji bo tekoşîna tev dem di refa PDK Îranê de dest ji hemû xweşiyên jiyanê û giştpile û payeyeke dewletî berda û wekî Pêşmergeyekê refên PDK Îranê ji xwe re hilbijartin û bi karê berdewam û dilsojane û nîşandana jêhatîbûnê, piştî heyamekê tev pileyên rêxistinî qetandin û gihîşte pileya Komîteya Navendî û Polîtbîroyê. Berpirsiyariya dawî ya Kekê Selam Ezîzî, berpirsiyariya Komîsyona "Siyasî – Nizamî"yê bû. Bê guman ji dest çûna wî xebatkarî ji bo tevgera Kurd û PDK Îranê xisareke mezin bû û ji bo me hevçeperên wî jî kul û xemeke giran û dilşewat.

Hevalên hêja!

Di çaxekê de em rêberê xwe yê şehîd, Dr. Qasimlo û xebatkarê emegdar yê gelê me kekê Selam Ezîzî bibîr tînin ku ji caran pitir navber yê ketiye nava xelkê Îranê û rejîma Komara Îslamî û valahî û veqetiyaneke kûr di navbera desthilat û xelkê Îranê de heye, bi curekê ku piraniya zaf ya xelkê Îranê vê rejîmê bi ya xwe nizanin û hêviya ji navçûna wê dikin û heke derfet ji wan re jî pêk were, amade ne çelengane dijî vê rejîmê xebatê bikin û bihiloşînin. Serbarê vê yekê ku bi sedema jordeçûna bihaya nift (petrol)ê di van du sê salên borî de Îranê pitirî 40 milyar Dolar paşketa

diravî heye, lê rewşa aborî ya welat gelek xirab e û xelkê Îranê ji destê giranî, jarî û destkurtiyê di welat de bêzar bûne û rastî dijwariyan hatine. Kirîz û pirsgirêkên cuda cuda ên siyasî, civakî û çandî hene û nebûna azadî û hebûna perçiqandinê xelk bi tevahî aciz kiriye. Lewra heke em bi pîvanên demokrasiyê ji rejîma Komara Îslamî re binêrin, demek dibe ku vê rejîmê rewayî û meşrûiyeta xelkî ya xwe ji dest daye û bi darê zorê xwe bi ser xelkê de sepandiye. Em piştrast in heke derfet û fersendeke herî kêm hebe, xelkê Îranê dê vê sîstemê bi awayekî giştî ret û mandel bikin.

Serbarê vê çendê ku serkut û givaş bi ser xelkê Îranê gelek zaf e, lê bi vî halî jî xelk bi awayê cur bi cur di derfetên herî kêm û mumkin de, nerazîbûnê xuya dikin û meş û xwenîşandanan lidar dixin. Li vir hêja ye em qala 2 nimûneyên berçav bikin ku her du di meha Pûşperê ya sala çûyî qewimîn:

Meş û serhildana şoreşgerane ya xwendekarên zanîngehên Tehranê û serhildana xwendekarên çend zanîngehên din di piştgîrî ji tevgera xwendekarî di 09.07.1999'an. Ya din jî serhildana şoreşvanane ya xelkê Kurdistanê ye ku ew jî di 09.07.2005'an de ku bi şehîd bûna Şiwane Seyîd Qadirî li bajarê Mehabadê dest pê kir û piştre piraniya bajarên Kurdistanê vegirt û li her bajarekê de hetanî heyamekê didoma. Mixabin herçiqas her du liv û hereketên han ji aliyên kirêgirtiyên rejîma Melayan bi xwînê hatin verdan, lê girîngî û bihaya wan serhildana li vê çendê de ye ku ne xwendekarên zanîgehên Îranê û ne xelkê Kurdistanê netirsiyan û heya ji bo bidestveanîn û dabînkirina xwastek û daxwaziyên xwe her mikum bûn.

Di asta navneteweyî de jî rejîm rastî pirsgirêkên pêtir bûye, maytekirin di kar û barên dewletên Felestîn û Îraqê de gelek ji caran eşkeretir e. Eva ji ber çavê kom û komeleyên siyasî û navneteweyî, nemaze dewletên xwedî biryar bizir nabe. Her wiha hewl û xebatên rejîmê ji bi zengînkirina Uraniyûmê û aqibet bidestxistina çeka Etomî ji ber raya dunyayê nahê veşartin. Bi kurtî em dikarin bibêjin, dewletên berpisyar û xwedî biryar bi hev re karê micid dimeşînin, bona wê çendê ku rejîma Komara Îslamî çekên Etomî ne bidest bixe, ew jî ziyan û zirareke zaf ji hitbara rejîmê û dîplomasiya Komara Îslamî dide.

Hevalino!

Partiya Demokrat dikare bi karê bikom, eqlê bikom, yekdilî û hevdengî û mifahwergirtin ji bîr û ramana Dr. Qasimlo ku wekî mîrateke bihagiran jê re bi cî maye, di nava xwe de valahiya Dr. Qasimlo û hevçeperên jêhatî û ji dest çûyî tijî bike û bi mifahstandin ji wan warên baş ku niha derketine rojevê û ev îmkanata propagendeyê ku di dest de heye, berdewam û çalaktir ji caran xebata siyasî, dîplomasî, rêxistinî û gelî bimeşîne û pitir û çêtir ji caran dijî dijmin raweste ku eva hem dibe sedema hêvîdarbûna xelkê Kurdistanê û hem dibe maya asûdebûna ruha bilind ya Dr. Qasimloyê mamosta, kekê Selam Ezîzî û tev şehîdên rêya azadî û bexteweriyê.

Silav ji mamostayê me yê rêber, Dr. Qasimlo di 17'hemîn bibîranîna şehîdbûna wî de.

Silav ji bo canê kekê Seyîd Selam Ezîzî, bi hinceta heftemîn bibîranîna ji dest çûna wî.

Silav ji canê paqij yê hemû şehîdên Kurdistanê û berdewamî ji bo rêya tejî serbilindî a wan.

Mirin û neman ji bo kevneperestî û terorîzmê.

Qasimlo Bîrmendeke Şoreşvan Û Aştîxwaz

Cemîl Kulahî

Di demekê de ku şoreşa netewî ya Kurd li Kurdistana Îranê ji bo bidestveanîna mafê netewî û rewa yên xwe bi sedema tepeserkirina bêrehmane ya desthilatên zal bi ser Kurdistanê de rawestiya bû û dengê mafxwaz ye vê netewa çewisandî bi awayekî ne mirovane fetisandibû, hatina Dr. Qasimlo bi nava qada xebata netewî, wekî bêhna mesîhiyayî bû ku ser li nû caneke taze li ber tevgera Kurd hate kirin, kete livînê û careke din vejiya. Ev jî vedigere bo vê çendê ku Dr. Qasimlo demeke zaf li welatên Ewropayî mijûlê xwendin û lêkolînê bû, ji bilî vê yekê mamostayê zanîngehê bû, wekî miroveke xwendekar, akademîk û dunyadîtî ji pirsgirêkên cur bi cur dinêrî, bi taybet pirsên têkildar bi şoreşa Kurdî. Lewra hemû hewl û tekoşîna wî eva bû ku rêyeke çareseriya zanistî û hemdem, ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd peyda bike. Ev cure nêrîn û ramane tişteke nû bû ku wî rêberê mezin dixwast bîne bo nava şoreşa Kurdan û jê re bike bingehek. Ji ber ku bi sedema vê çendê ku tevî siyaseta cîhanî û dunyaya derve û her wisa bi siyaseta hikûmetên zal bi ser Kurdistanê û herêmê de nasyarî hebû. Şarezayiyeke kemilî li ser jeopolîtîk û hilkevta demografiya Kurdistanê û giraniya siyasî ya Kurd hebû û siyaset û rêzaniyên xwe li ser wan rastiyane didarêt, çunkî karê siyasî li gor ramana Dr. Qasimlo, xwediyê sê xwasmaniyên sereke bû, ku hetanî wê demê di nava tevgera Kurdî de nedihatin dîtin, lewra ji bo cihgirkirina wan di nava bizava Kurd de cehd û hewla bêrawestiyan di da:

1. Rastdîtin di siyasetê de
2. Serxwebûna biryardanê di siyasetê de
3. Cîgirkirina exlaq (sinc) di siyasetê de

Dr. Qasimlo hemû demekê ev yeke dubare dikir ku **siyaset hunera mumkin** e û digot ku xala jar û qels ya tevgera Kurdî eva bûye ku hetanî niha yan **hemû tiştek** xwastiye yan **çi tiştek**, lewra digot siyaset ne **reş û sipî** ye, belkî di navbera reş û sipî de rengê din jî hene. Bi baweriya Dr. Qasimlo siyasetkirin tevî hêviyan cudahiyeke kûr heye. Çunkî bi baweriya wî siyasetê pêwendî bi rastî û heqîqetên hundirîn, herêmî û cîhanî ve heye û bingeha hêviyê jî li ser xeyalê ye, ku eyan e xeyal û rastî du tiştên bi tevahî li hev cuda ne. Wî rêberê mezin di hilgirtina dirûşmên xwe de, daxwaziyên xwe de û bi giştî di siyasetkirinê de rastiyên hundirîn, herêmî û cîhanî analîz dikir û piştî nirxandineke zanistiyane raya xwe dida xuya kirin. Hebûna ramanên wisan di siyasetê de karek kiribû ku Dr. Qasimlo dirûşmekê hilbijêre ku ne tenê jê re cî bi cî bibe, belkî tevî rastiyên Îranê bi giştî û bi taybetî Kurdistanê de hev bigire, ji ber ku xwe di pêxema wan dirûşm û daxwaziyan de bi berpirs dizanî û digot ku em **partiyek berpirsyar** in, lewra ye divêt di hemû waran de em **berpirsane** bilivin û tevbigerin.

Teybetmendiyeke din ku Dr. Qasimlo di kar û xebata siyasî de li ser de biîsrar bûye, **serxwebûna biryardanê di siyasetê de** bû. Ji ber ku wî jêve bû ku tu aliyeke herêmî û navneteweyî bi radeya rêber, partî û aliyên siyasî yên Kurdistanê li ser rastiyên zal û balkişandî bi ser Kurdistanê de ne şareza ne, lewra eva ku divêt biryarê bide, rêber, partî û aliyên siyasî yên Kurd in û tu kesê heq nine û nikare bêy wan û raya wan li ser Kurdistanê biryarê bide. Yek ji wan sedeman ku wî li ser serxwebûna siyasî biîsrar bûye, eva bû ku karê siyasî û siyasetkirin ji bo çawaniya

birêvebirina welat û parastina vêc û berjewendiyên natewî ye, ku bêy serxwebûn di biryardanê de ev du tişt cî bi cî nabin. Di şirovekirina pirtûka "Basek kurt li ser sosyalîzmê" de wiha li ser girîngiya serxwebûnê diaxive: "Em seba dostîniyê qet dest ji serxwebûna xwe û qazancê neteweya xwe ber nadin, lê li ber xetera serxwebûn û qazanca neteweya xwe heke hewce be, em dê dest ji dostîniyê berdin. Lewra pîvan ji bo me qazancê partiyê, gelê Kurd û gelên Îranê û serxwebûna me ye. Pîvana bingehîn serxwebûna biryardanê ye, em dostîniyê dikin, lê tevî parastina serxwebûnê, heke hewce bû em dostîniyê gorî serxwebûnê dikin, lê em tu demekê serxwebûnê gorî dostîniyê nakin". Her ji ber vê sedemê bû ku Dr. Qasimlo giştdemekê li ser bingeha rêz girtina du aliyane pêwendî tevî aliyên din pêk aniye.

Taybetmendiya sêyemîn ku di siyaseta Dr. Qasimlo de diyar e û bi xwe jî baweriyeke kûr pê re hebûye **exlaq di siyasetê de** bû ye. Lewra di vî warî de dijî her cure bêûsil û bêqeydê, gotinên kirêt û nexweş û fend û fêliyê di siyasetê de bû. Lewra di kar û xebata siyasî de bi kiryarên însanî, wêjeya gelî û popolîstî û paqij baweriyeke kûr hebûye. Di vî warî de bi xwe jî dibêje: "**Em bêûsilî û bêqeîdeyî û dijûndanê di siyasetê de ret dikin û ji bo cihgirkirina sinc di siyasetê de dixebitin**".

Bi sedema hebûna van cure nêrîn û ramanane di karê siyasî de ye ku Dr. Qasimlo ji şer re wekî taktîk dinêre, taktîk ji bo gihîştin bi aştî û tenahiyê. Çunkî li ser vê baweriyê bû ku Kurd ne xwediyê wê hêzê ye ku bikare dijminê bi tevahî teyar bi çekên nûjen ji nav bibe, lewra divêt Kurd şerê çekdarî wekî taktîk ji bo mandîkirina dijmin bi kar bîne, heta wê demê ku dijmin neçar bi gotûbêjê be. Gotûbêj û diyalog bi baweriya Dr. Qasimlo wekî awayek ji şeklên xebatê dihate dîtin, Dr. Qasimlo jêve bû her aliyekê ku bawerî bi vê yekê nebe **deriyê siyasetê** li ser xwe de girê daye. Di vî warî de, li ser girîngiya gotûbêjê dibêje: "**Di rastî de ez bona gotûbêjê şer dikim, çunkî em dibêjin pirsgirêka Kurd re çareseriya leşkerî tune ye**". Li ser vê bingehê bûye ku hemû demekê di çaxê xebata dîplomasî û têkilîkirin bi welat û aliyên din ve daxwaza piştgiriya siyasî ji doza Kurd kiriye ku eva tiştek e ku di nava şoreşa Kurdan de nû ye. Lewra Dr. Qasimlo ji bo bidestveanîna piştgiriya siyasî ji tevgera Kurd di asta cîhanî de hewl û bizaveke zaf dide, bo mînak têkoşîna bê nimûne ya dîplomasiyê ji bo pêkanîna konferanseke navneteweyî bo çareserkirina pirsgirêka Kurd rê xistibû ku eva jî vedigere bo wê ramanê ku wî jêve bû ku divêt pirsa Kurd di forma hundirîn û herêmî bihê derxistin û bibe pirseke navnetewî. Di vî warî de digot: "**Divêt em ji tev wan kesan re ku guhdariya gotinên me dikin, bibêjin ku daxwaza Kurd gelek sade û rewa ye, Kurd mafê xwe yê netewî dixwaze ku di Carnameya Gerdûnî ya Mafê Mirovan de hatiye, wate tiştek ne zêde ye, lewra bo mînak daxwaza Otonomiyê pirseke ne hundirîn e. Li gelek ji welatên weke dewleta Îranê de heke basa Otonomiyê tê kirin, dibêjin ew dozeke hundirîn e û ne mafê tu kesekê ye ku dest têwerde û pêre tevbigere. Lewra pirsa Otonomiyê, ne meseleyeke hundirîn e û parek ji mafê mirovan e. Lewra jî ew dewlet, rêxistin û kesayetiyên ku xwe bi aligirê mafê mirovan dizanin, hewce ye ji daxwazên rewa yên neteweya Kurd piştgiriyê bikin**."(Rojnama KURDISTAN, hejmara 187)

Ji bo gihîştin bi vê meremê, yanî cîhanîkirina pirsgirêka Kurd, bi vekirina bîroya nûneriyê ji PDK Îranê re li welatên cuda cuda, têkilîkirin bi partî û aliyên siyasî yên welatên derve, lidarxistina civîn û semînarên cur bi cur û hevpeyvîn tevî medyayên giştî li ser pirsgirêka Kurd, karî bi başî pirsgirêka Kurd bi welatên derve bide naskirin, ku encam, vêc û qazancên bihagiran yên wan awayên xebatê her zû derket û bandoreke erênî li ser pirsgirêka Kurd danî.

Dr. Qasimlo ji bo pêşdebirina vê siyaseta rast û dirust ku girtibû beriya xwe û cihgirkirina wan di nava tevgera Kurd de, di hundirê vê tevgerê de jî hewl û xebateke bêrawestan bo guhartinan dida, ji ber ku vê tevgerê di hindek waran de hewcehî bi reforman hebû. Her wiha ji bo derketina rûçikê delal û xweşik ji vê tevgerê re li rex raya giştî ya derveyî welat, pêwîst bû tevgerê ji hinek kar û kiryarên ne mirovane û biyom dûr be û paqij biparêze. Ji ber ku dizanî ku dunya ji tevgerekê re ku têkel bi karê ne mirovane bibe, piştgîriya siyasî nake. Xebat dijî terorîzmê, dijî nasyonalîzma berçavteng, xebat ji bo cihgirkirina demokrasî û bihayên nûjen û modern di nava tevgera Kurd de, xebat dijî her cure cudahîdananeke zayendî, ragezî, olî û netewî, dijî her cure takekes perestiyekê û hwd... ji wan nirxan bûn ku Dr. Qasimlo bêrawestiyan hewl dida ku bîne nava tevgera Kurd de.

Dr. Qasimlo hemû demekê eva dubare kiriye ku ji bo gihîştin bi armancên pîroz û rewa, divêt alava pîroz û rewa bihê bikar anîn, çunkî li ser vê baweriyê bûye ku tevgera Kurd, bizaveke berheq e û tevgereke ku di rêya mafên mirovî yên neteweyên bindest de serî hildaye, lewra nabe rûçikê vê tevgerê bi sedema karê terorîstî ve ku bi **alava ne pîroz** li nav dike, di nava raya giştî ya cîhanê de xirab bihê kirin. Lewra her çiqas Dr. Qasimlo rêberê partiyeke çekdar bûye û şerê çekdarî meşandiye, lê hevdem tevî vê çendê reşkuştin, êxsîr kuştin, lêdan û îşkence, teror, rehîngirtin, revandina balafiran û teqandinê mehkûm û şermezar kiriye. Lewra ew şerê ku Partiya Demokrat dikir di şeklê rûyekî û naverokê de tevî terorîzmê cudahiyeke kûr hebûye. Dr. Qasimlo derbarê wî şerî ku PDK Îranê dikir, digot: "**Nabe bîra me biçe ku Pêşmerge di pêxema bidestveanîna wan armancên gelê Kurd xebatê dike ku dijminê azadiyê ne amade bûn bi aştiyê wan qebûl bikin û ji bo perçiqandin û binpêkirina daxwaziyên gelê Kurd êrîş kirine û şer bi ser xelkê Kurdistanê de sepandine. Lewra şerê Pêşmerge bo berevanî ji azadiyê, şer di pêxema mafeke rewa de ye û di encam de şer ji bo gihîştin bi aştiyeke serbilindane û adîlane ye**". Eva naveroka şerekê ye ku Partiya Demokrat kiriye, lewra ye ku wî rêberê zana hesaba xelkê sivîl û bê berevan ji hikûmeta serkûtker ya Melayan cuda dikir û dijî pêkanîna tirsê bo ser jiyana xelkê sivîl bû. Li ser vê bingehê bû ku terorîzm û tevgerên netewî ji hev cuda dikirin û di navbera wan de cudahî didanîn, digot eva du tiştên ji hev cuda ne, li ser vê yekê tekez dikir û digot: "**Terorîzm û tevgerên rizgarîxwaz yên netewî du pirsên cuda ji hev in, di şerê çekdarane yan partîzanî de ji bo azadiya neteweyekê penabirin bo ber terorîzmê ne hewce ye. Berevajî ez bawer im tevgerên bihêz, ew tevgerên ku di rêyên demokratîk de diçin, rênûmayî tên kirin, alîgirî û piştgiriya xelkê bi wan re ye, tu hewcehiya wan ji bo penabirin bo ber terorîzmê nine**".

Dr. Qasimlo hetanî wî cihî çarçoveya şermezarkirina terorîzmê berfireh dike ku ew rêxistin û partiyên Kurdî jî ku stiratêjiya xwe li ser vê bingehê ava kirine, vedigere û dibêje: "**Armanca wan tevî armanca tevgera rewa ya Kurd ne yek e**". Çunkî cuda ji vê çendê ku tirsa xirabûna rûçikê tevgera Kurd di nava bîr û raya giştî ya cîhanê de hebûye, tirsa vê çendê jî hebû ku hikûmetên desthilatdar bi ser Kurdistanê bona vê yekê ku bizava Kurd bêîtbar bikin û hêcetê ji bo mîlîtarîzekirina Kurdistanê bînin û xwe wekî parêzerê azadî û mafê xelkê bidin xuyandin, ji kiryarên terorîstî ku ji aliyê wan girûpane diqewimin, mifaheke nebaş bistînin, lewra giştçaxekê ev yeka ji hêzên Kurd re dubare dikir û rêniwînî dikirin.

Dr. Qasimlo cuda ji vê çendê nasyonalîzma berçavteng jî ret dikir û li ser dostîniya navbera gelan de tekez dikir û bêrawestiyan ji bo yekîtiya navbera neteweyên bindest yên Îranê hewl û cehd dikir û bo ji hev nêzîkirin û têkiliyên dostane di navbera wan neteweyan de dixebitî. Dr. Qasimlo li ser vê baweriyê bû ku hevalbendên stiratêjîk yên me, neteweyên bindest yên Îranê ne. Her wiha gihîştibû baweriyê ku tenê bi hevgirtin û hevxebatiya neteweyên Îranê ye ku sîstemeke demokratîk di Îranê de cihgir dibe. Di vî warî de dibêje: "**Tevgera gelê Kurd her çiqas bihêz jî be, aliyê zaf tenê dikare rejîmê jar û rêyê ji bo hiloşandina rejîmê xweş bike, lê tu demekê nikare bibe**

altirnatîv, lewra me berdewam hewl daye ku pêwendiya navbera tevgera gelê Kurd û gelên din yên Îranê xurt bikin."

Lewra di demên dawîn yên jiyana xwe de tevî vê çendê ku berevaniyê ji mafên Kurdan dike, li ser dabînbûna mafên neteweyên din jî tekez û îsrarê dike. Bi anîna navê wan netewane, dibêje: "**Heke îro pirsgirêka wan netewan çareser nehê kirin, di pêşerojeke nêzîk de divêt em li benda bûyerên nexweş bibin**". Ev raman û hizre vê rastiyê derdixe holê ku Dr. Qasimlo nasyonalîzma berçavteng bi tirs bo ji hev belavbûna xebata mafxwazane ya gelên bindest yên Îranê û her wisa bi rê xweşkirin ji bo pêkhatina bîra şovenîstî û mezinxwaziyê zaniye, ku eva bi xwe dibe berbend û astengek li ser rêya hevgirtina neteweyên Îranê û ji hev dûrketina wan. Lewra Dr. Qasimlo bo berlêgirtin ji serhildana nasyonalîzma berçavteng û her cure mezinxwaziyekê, dixebitî ku tevgera Kurd demokratîze bike, lewra digot xebata me bi tenê ne **neteweyî** ye , belkî xebateke **neteweyî demokratîk** e. Ji ber ku Dr. Qasimlo li ser vê baweriyê bû ku mirovê/a demokrat, mirovan ji her netewe, regez û olekê bibin, ji wan re wekî hev dinêre û dixebite ku nirxên mirovahiyê di nava civakê de pêşde bibe. Lewra derbarê girîngiya demokrasiyê di nava şoreşê de digot: "**Nabe tu demekê xebat ji bo demokrasiyê biçe bin xebat ji bo mafê neteweyî yan xebata tex û çînayetiyê**". Eva wê rastiyê derdixe holê ku Dr. Qasimlo demokrasî bi kilîta çareseriya pirsgirêkan dizanî, lewra bê westiyan hewl dida ku demokrasiyê weke bingehekê bîne nava tevgera Kurd. Dr. Qasimlo bo ji holê rakirina berçaviya takekesperestiyê di nava tevgera Kurd ku jêve bû, astenga sereke ya cihgirbûna demokrasiyê di nava vê tevgerê de ye, cehdeke zaf da ku vê ramanê du vêc û qazanc di şûnde hebû: 1- Negirêdana tevgerê bi takekes, 2- Perwerdekirina mirovên biwêr, netirs û çeleng. Lewra digot: "**Di cîhanê de tu nemetek ji azadiyê ne binirx û pîroztir e. Azadî keramet û kesayetiyê dide mirovan û rêyê nade mirov bibin bi muhre ... mirov divêt ji haletê muhrê de bihê der, bibe kesayetî, bibe keseke/a zindî û çeleng yê/a civakê**".

Ji bilî vê çendê Dr. Qasimlo bo ji navbirina her cure cudahîdananeke zayendî dijî jinan xebitiye û bo ji navbirina binpêkirina mafê jinan hewl û bizav kiriye ku di vî warî de dibêje: "**Jin nîviya civakê ne. Her çiqas jin kêmtir di kar û barên civakê de beşdar bibin, ew qas kar, tekoşîn û afirandin di civakê de kêmtir e û her ew hinde jî civak paşverûtir e. Lewra radeya beşdar bûna jinan di hemû warên jiyana civakî û siyasî de, nîşana pileya pêşketina her civakekê ye**."

Ev cure bîr kirine demokratbûn û nûjenbûna wî rêberê mezin nîşan dide ku bi anîna wan rêbazên rast û biqeîde û azîn bi nava tevgera Kurd, bû sebebê vê çendê ku tevgera Kurd bikeve ser rêbazeke nûjen û hemdem. Rêbazek ku bû sebebê pêşdeçûna roj li pey rojê ya PDK Îranê wekî pêşengê tevgera Kurd li Kurdistana Îranê. Lewra divêt em bîr û rêbaza Dr. Qasimlo û rêniwîniyên wî rêberê mezin ku bang û gaziya wî pêkanîna civakekê pêka biha û nirxên mirovî dikir, bi kiryar di nava civakê de xurt bikin, pêşde bibin û her wiha wan cihgir bikin.

Werger: Azad Kurdî

Di 17'emîn Salvegera Terora Dijî Dr. Qasimlo De, Pêlên Nerazîbûnê Tev Kurdistan Bi Xwe Ve Girt

Di tev bajar, bajarok û herêmên cur bi cur ên Rojhilata Kurdistanê de hate ragihandin ku piştî belavbûna bangewaza PDK Îranê ku tê de daxwaz ji xelkê hatibû kirin di roja pêncşem, 22'ê pûşperê de ji bo rêzgirtin û bibîranîna Dr. Qasimlo û hevrêyê wî Ebdula Qadirîazer, nerazîbûna xwe bi dijî rejîma terorîstperwer a Îranê bi daxistina dikan û temirandina çirayan bo dema 3 deqîqan nîşan bidin, demjimêr 23'ê haman rojê de û di bersiva

Bajarê Mehabadê

daxwaza han de, pêlên nerazîbûnê bi dijî Komara terorîstî a Îranê ji deryaya xelkê Rojhilatê Kurdistanê bilind bûn.

Li gor agehiyên gihîştî bi me, xelkê piraniya bajar û herêmên cur bi cur yên Kurdistanê di bersiva daxwaza PDK Îranê de bi awayekê bê wêne dest avêtin daxistina dikan û bazaran û çirayên malên xwe seet

Daxistina dikan û bazarên Mehabadê

23'ê heta 23:03 deqîqeyan temirandin. Her wiha dirûşm û belavokên PDK Îranê û wêneyên şehîd Dr. Qasimlo bi awayekî berfireh hatin belav kirin.

Çalakiyên han di wan herêmên ku di jêr de tên berçavtir bûn:

Urmiye, Selmas, Pîranşar, Nexede, Şino, Mehabad, Bokan, Bane, Serdeşt, Rebet, Sine, Merîwan, Dîwandere, Nûdşe, Kirmaşan, Gîlana Rojava(Gîlanê xerb), Serpilzehav, Kamyaran, Kerend û Qesrşîrîn.

Di Xwenîşandana Viyenê De Kurdan Daxwaza Xistine Rojeva Dosya Terorkirina Dr. Qasimlo Û Hevalên Wî Kirin

Bi hinceta 17'emîn salvegera terora dijî Dr. Qasimlo û hevalên wî û her wiha xistine rojeva dosyeya vê terora nemirovane pêtir ji 1000 kes ji Kurdên rûniştiyê welatên Ewropayê, xwenîşandanek li Viyena serbajarê Otrîşê pêk anîn. Di vê meşê de ku ji aliyê PDK Îranê û Yekîtiya Ciwanên Demokrat a Kurdistana Îranê ve hatibû lidarxistin, Kurdên hemû parên Kurdistanê, hin rêxistinên Îranî weke "Ekseriyet" û nûnerên PDK û YNK jî amade bûn.

Pîtir Pilîts dibêje Ehmedînejad di trorkirina Dr. Qasimlo de dest hebûye

Parlemantarê endamê Partiya Keskan ya Otrîşê, Pîtir Pîlîts di hevpeyvînekê de ragihand ku wî belge û girovên rast û dirust di pişikdariya Serok Komarê niha yê Komara Îslamî li terora dijî Dr. Qasimlo ji dest de hene. Navhatî herwiha da zanîn serbarê wê ku dewleta Otrîşê haydarê gotûbêjên aştiyê di navbera Îran û PDK Îranê de bû, cihê heyrîmayiyê ye ku çawa û çima dewleta Otrîşê erkê parastina rêberên Kurd bi cih neaniye.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo rêberê gelê Kurd û Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, Ebdulah Qadirî Azer nûnerê vê partiyê li derveyî welêt û Dr. Fazil Resûl, li 13.07.1989'an de li dema danûstandin ji bo çareserkirina pirsa Kurd li Kurdistana Îranê, ji aliyê nûner û dîplomatên terorîst yên rejîma Îslamî ya Îranê ve hatin teror kirin.

Jin Di Yekemîn Ceribîna Hilbijartina Kuweytê De

Çinûr Qadirî

Piştî şoreşa Fransayê û pesendkirina Qanûna Bingehîn û danezana gerdûnî ya mafê mirovan û welatîbûnê di 26'ê Tebaxa sala 1789'an de, esla wekheviya navbera tev welatiyan hate pejirandin. Lê di şoreşa Franse de mafê welatîbûnê ji bo jin û jar û belengazan bi fermî nehate naskirin û tenê mafê dengdanê ji tevahiya mêran re bi fermî hate nasîn. Derheq mafê dengdanê ji bo jinan divêt em hetanî sala 1944'an ya Zayînî yanî aliyê kêm 150 salan piştî şoreşa Fransayê çavnihêr bin heya mafê wekhev yê jinan bi fermî tê naskirin û esla yek kes û yek deng û wekhevî di siyasetê de tê îlan kirin.

Roja 29.06.2006'an, jinên Kuweytê di halê rawestan ji bo dengdanê. Eva cara yekemîn e ku jin dikarin di hilbijartina Parlemana Kuweytê de xwe berbijar bikin û deng jî bidin.

Derbarê rola jinan di xurtkirin û berbipêşdebirina demokrasiyê de, sedemên zaf yên çandî, civakî û siyasî di holê de ne ku renge hindek caran tevî hev natebahî hebin, sedemên wekî bajar akincîbûnê, zafbûn û jordeçûna pileya zanîn û xwendewariyê, pêşketina demokrasiyê di yasa û di jiyana civakî de, pitirbûna "NGO"yan, hezkirin û biîsrarbûna jinan ji bo beşdarî di warên civakî û pejirandina serxwebûna hêdî hêdî ya jinan wekî welatiyeke azad û pêkhatina wekheviyê di navbera kargeh û karkirinê li derveyî malê û bi taybetî piştrastbûna jinan bi hêza xwe û jordeçûna asta hişyariya siyasî a jinan û rola perwerdehî û bandorekê ku dikarin li ser evlad û hevjînên xwe de pêk bînin, ji sedemên erênî û bibandor yên cihgirkirina demokrasiyê di welat de ne.

Di hemû welatên cîhanê de jin nîviya pêkhateya nifûsê pêk tînin. Di Rojhilata Navîn bi giştî û nemaze di welatên Erebî de jin ji mafê qanûnî, hiqûqî û mirovî ên xwe bêpar in. Di wan welatan de rejîmên paşverû bi awayê hewce û jêhatî tevî yasa û rê û cihên navneteweyî mafê jinan jî barçav nagirin û rê nadin ku jin rola bingehîn ya xwe di gişt warên siyasî, civakî, çandî û hwd ... li civatên de bilîzin.

Li pey hatine rojeva projeya Rojhilata Navîn ya Mezin û basa demokratîzekirina van welatane bi awayê micid ji aliyê dewletên mezin yên cîhanê ve, dewletên paşmayî û kevneperest bi xwe ketine û dixwazin bi pêkanîna hinek guhartinan xwe tevî vê pêvajoyê rê bixin. Bo mînak di nava du salên dawiyê de nêzîk bi 12 hilbijartin di welatên girtî û paşverû yên Rojhilata Navîn de hatin lidarxistin.

Kuweyt yek ji wan welatan e ku mafê dengdana jinan û başdarî û çalakiya jinan di civakê de qedexekiribû û jinên vî welatê Erebî nedikarîn post û berpirsiyariya hikûmetî û fermî li stû bigirin. Lê Parlemana Kuweytê bo cara yekemîn di dîroka xwe de di meha Maya sala 2005'an de, mafê dengdan û berbijarî di hilbijartinan da jinan. Li pey girtina vê qanûnê de, jinên Kuweytê di roja 4'ê Avrîla 2005'an de, di hilbijartina şaredariyê de deng dan.

Di roja 29.06.2006'an de, bo cara yekemîn di dîroka vî welatî de jinan karîn di hilbijartina civata qanûndana welatê Kuweytê, yanî Parlemanê beşdariyê bikin.

Xala balkêş ya hilbijartinên Parlemana Kuweytê a vê carê, xwe berendamkirina 28 jinan li rex nêzîk 250 berbijarên mêr ji bo bidesveanîna 50 kursiyên Parlemana wî welatî bû. Berendamên wek **Rola Deştî** (Duktora ji Zanîngeha Hapkînza Amerîka), **Fatme El Ebdalî** (Duktora ji Navenda lêkolîna jîngehê), **Xalide El Xedar** (Duktora tenduristiya giştî) û **Nebîra El Necarî** û ... ji jinên herî xuya yên vê gerê ji hilbijartina Parlemana Kuweytê bûn. Piraniya jinên berendam ji xebatkarên warê mafê jinan di Kuweytê de ne.

Bînin ber çavê xwe, di welateke wekî Kuweytê de ku jin pareke barçav ji nifûsa vî welatî pêk tînin ji mafên xwe ên hiqûqî û siyasî hatibûn bêpar kirin. Di halekê de ku radeya dengderên jin ji mêran zaftir bûn (195000 jin li hember 145000 mêran), ev pirse derdikeve holê ku çima jinan nekarîn heta kursiyeke Parlemanê jî bi dest bixin?!

Bêguman kultura zal ya mêr serdestiyê di civaka Kuweytê de û hinek sedemên çandî û deb û edetên kevneşop ku di civaka Kuweytê de bi awayekê rih û bingeh dakutane ku heya jinên Kuweytê ne amade bûn dengê xwe bidin jinan û bikarin di yekemîn ceribîna hilbijartinê de ku jin tê de beşdar in, serkevtinê bidest bixin. Herçiqas jinên Kuweytê di vê gava dîrokî de serkevtî nebûn, lê ji holê rakirina vê çandê û deb û edetan û nêrînên zal ên paşverû demeke zêdetir dixwaze.

Bi giştî em dikarin vê ceribîna hilbijartina Parlemana Kuweytê ku bo cara yekemîn di dîroka wî welatî de jinan jî mafê dengdanê hebû, gavek erênî û pozetîv bihesibînin.

Di heman demê de divêt jinên Kuweytê bo ji nav birina van kosp û astengên pêşiya serkeftina xwe xebat û tekoşînê bidomînin û bi beşdariya çeleng ya xwe di tev warên civakê de roleke girîng bilîzin.

Jin Di Ramana Rêberê Nemir Dr. Qasimlo De

"Di gavekê da ku jin çavkaniyeke herî xwedî hêz in bo hunermendan heta berheman biafrînin, hizr û bawerên kevin ên Xumênî meqamê jinan aniye xwarê û ev kirine rihberekî bê vêc, rihberek ku tenê jêhatî koyletiyê ye û neçar e di malê da heps be, heta xizmetê bi mêran bike û dûr ji civata mêran domê bide jîne."

"Jin her çiqas pêtir di kar û barên civakî û siyasî de beşdariyê bikin, civak pêşketîtir û her çiqas di tevgera siyasî ya neteweyekê de jin pêşverû bin, ev tevger pêşketîtir û dê şans û bextê serkevtinê pêtir hebe."

Serdemê Bav Serdestiyê

Amadekar: Hemîd Muxtarî

Xwendevanên hêja, her wek hûn dizanin me di hejmara berê ya weşana Agirî de baseke kurt li ser serdemê dayîk serdestiyê pêşkêşî we kir û qirar bû di vê hejmarê de em ji civaka dayîk serdestiyê vegerin bo civaka bav serdestiyê û sebebên wê ji we re bidin ber şirove û dahûrandinê.

Her wek me di hejmara berê de jî bas kir, bi wan serkeftinên ku jinan di warên, malbatî, aborî, perwerdehî, civakî û siyasî de bidestve anîn, dewranek di jiyana mirovahiyê de dest pê kir ku bi navê serdemê Jin Serdestiyê (Dayîk Şahî) bi nav û deng bû, lê tevî vê yekê ku jinan karîn wan serkeftinên xwe bi hezaran salan di civaka destpêkî ya mirovahiyê de biparêzin, bi hinek sebebên ku emê niha ji we re bînin ber bas, ev yeka nekarî heta heta bimîne û hêdî hêdî piştî dewranekê ji wekhevbûn di desthilatê de, serdemê bav serdestiyê (bav şahî) dest pê kir ku niha jî nîşaneyên wê bi awayekê tên berçav.

Wîl Durant dibêje: "Dubendiya berxwedaniyê ku îro rojê di navbera jin û mêr de tê dîtin, di vê demê de gelek berçav nebû". Ev natebahiya pitir di rewşa jiyanê û xwezayê peyda bûye û di warê kûrî û zatî ve bi qasê hewce ne balkêş e. Jin di wê demê de di warê sebir û peydakirina rêya çareseriya pirsgirêkan û dilêriyê tu ji mêr kêmtir nebûye û mêr weke alaveke cinsî (zayendî) ji jinê re nedinihêrî, belku canlibereke bihêz bûye ku kariye bi çendîn seetan bi encamdana karên dijwar û giran mijûl be û heta li dema pêwîst jî di rêya parastina zarokan û eşîra xwe de heta astê mirinê şer kiriye.

Lê piştre ku mêr bi her awayekê karî bibe xwediyê qawet û hinira zaf ya cendekî yan her ji destpêkê de xwediyê wê hinirê bû, karî bi mifah wergirtin ji xwe û bi bikaranîna heywanên barkêş, jinê rastî rewşeke cuda bike, bi awayekê ku bi xwe karîn hêdî hêdî karên berhemanînê li stû bigirin û jin ku hemû kare bû, piştre di malê de ma û mijûlê kar û barên nava malê bû. Bi vî awayî mêr bû cihgirê jinê û serokatiya malbatê kete destê wî û piştî demeke kurt, serdemê bav serdestiyê dest pê kir.

Ji destpêka vê dewranê jî jin xwediyê mafê wekhev tevî mêr bû û hetanî dikarî aboriya malbatê birêve bibe, lê hêdî hêdî bi xurtbûna pezdarî (xwedîkirina malatan) û cotkariyê, bihagiraniya mêr roj bi roj zêdetir bû û seba hinek erkên pîşeyî (senetî û hozanî) bo derveyî malê (yanî bo mêran), erkên nava malê yên

Wêne ji malpera chatrbaz.com hatiye wergirtin.

jinan kêmtir bûn û hêdî hêdî ji çarçoveya berhemanînê bi wî awayî ku li berê hebû hate derê û tenê kar û barên xizmetkirin û selîqeyî di nava malê de ji bo jinê bicî ma.

Wîl Durant vê yekê bi vî awayî şirove dike: "Dema ku pîşesazî û cotkarî ber bi pêşve çû û kemilî û berhemên zaf bi destve anî, mêrî karî hêdî hêdî desthilata xwe li ser jinê xurt bike." Bi pêşketina teknîka xwedîkirina heywanên kedî, çavkaniya nû ya dahatê kete destê mêrî de û bi vî awayî jiyan bihêztir bû û ewlehiyeke zaf bi xwe ve dît. Hetanî cotkarî ku ji rêya sikur stûrên serdemê kevn ve weke kiryareke bê biha dihate hesibandin, di encam de bala mêrî bi giştî ji bo aliyê xwe ve rakêşaye û desthilatdariya aborî ku dema xwe jinan di vê rêyê de bi destve anîbû, ji dest wê de derbixe. Dest bi dest kirina rêveberiya aborî ku heta vê demê ji aliyê jinê ve dihate encam dan, kete nava çarçoveya desthilata mêrî de, mafê dayîkê li hember mafê bavî de xwe êxsîr kir û rastî têkçûnê hat û malbata bav şahî ku mêrê mezin yê malbatê rêveberê wê bû, di civakê de weke yekîniya aborî, yasayî, siyasî û sincî hate naskirin, piraniya Xwedayên vê demê ku weke jinê dihatne çêkirin, piştre weke mêrên xwedî rih û rîşe hatne çêkirin ku di rastî de nîşanderê bav û şêxên eşîrê bûn. Hatina serdemê bav şahiyê derbeyeke giran bo ji nav birina desthilata jinê tê hesibandin. Piştî wê demê ji bo zewicînê her çawa kole û xulam di nava bazarê de dikirin, bi wî awayî jin jî dikarîn û li dema mirina mêr, jin jî weke milk û malê mêr bi mîrat didan.

Sîstema bav serdestiyê ku tevî xwedîtî û dest bi dest kirina wê weke mîrata mêrane bû û her ev yêka mafê mêran û serokatiya gerdûnî, olî û siyasî ya wî zêdetir kiriye û yasayên wisa pêk aniye ku desthilatdariya wî hetanî niha jî didome.

Wîl Durant dinivîse: "Di hemû ciheke erdê, bihagiraniya jiyana jinê ji mêrî kêmtir bûye û ger jinan keçek dibûn, ew rê û resma û cejna ku li dema jidayîkbûna **kur** dihate girtin û birêve diçû, ji bo **keçan** tişteke wisa her tune bû".

Di serdemekê de ku jin pîroz bû, di vê dewranê de li bal hinek eşîr qewm û gelan nemaze di dema ku jin di nava şûva xwe de bû, weke heyberek pîs û mirar dihate nihêrîn û heta rêya xwe şiştinê û paqijkirina xwe di nava avê de jî nedidanê.

Wîl Durant derheq pirsên zayendiya mêran di vê dewranê de dibêje: "Mêr azad û dest vekirî bû ku li derveyî malê de têkiliyên cinsî hebe, lê jin di sîstema bav serdestiyê diviya namûs û şerefa xwe heta dema zewicînê biparêze û piştî zewicînê jî diviya bi giştî bi mêrê xwe re emegdar bimîne û bi vî awayî ji bo rabûn û rûniştina her yek ji du cinsan (nêr-mê) çarçoveyakî sincî ji hev cuda pêk hat."

Wîl Durant di warê vê çarçove çêkirinê de dibêje: Di hemû dîrokê de em nikarin hetanî mînakekê li ser vê yekê peyda bikin ku civakê ji mêrî xwastibe ku heta dema zevicînê namûs û şerefa xwe biparêze û di hemû warekê de jin ketiye ber bê hurmetî kirinê û bê qîmet bûye. Dewranek ku heta niha jî li piraniya welatên Rojhilatî û bi taybet welatên Erebî û welatên weke Îranê de her berdewam e."

Nerazîbûn Li Hember Hebûna Mayînan Û Navendên Leşkerî Li Serdeştê

Li gor agehiyên Rêxistina Mafê Mirovan li Kurdistanê, hefteya borî jineke Serdeştê bi navê **Sebrî Biryadî** bi sedema teqîna mayînê pêyeke xwe ji dest da. Navhatî hevjîna kedkareke belengaz û destkurt bi navê Ebabekr Mam Simayîlî ye. Gel li bajarê Serdeştê bi xurtî li hember hebûna navendên leşkerî li nêzîk avahî û malan û ne paqijkirina qadên mayînan li vî

bajarî nerazî bûne. Raydar û organên rejîma Îslamî ya Îranê bo ji holê rakirina meydanên mayînan û dûrkirina navendên leşkerî ji cihê jiyan û akincibûna welatiyan tu gavek ne avêtine.

Hetanî niha jî bi dehan û sedan kes ji welatiyên Serdeştê û bajarên din dibin goriyên teqîn û telikên mayînan.

Albûma Cendekên Me

Evdile Koçer
evdilekocer@yahoo.com

Êdî her tişt kifş û eşkere ye, êdî her tişt bêminetî ye looo...

Şerên ku mêrên berê dikirin, li dû me ma.

Şerên nû li ber devê deriyê me ne.
Îro her tişt wekî ekranên televîzyonê li ber çavê me ye.
Belkî haya we jê hebe, lê em dîsa jî bi hev re bixwînin: "Zarokên ku li ser sergoyekê nêzikî Bajaroka Încîrlîka Edeneyê kaxez kom dikirin, li ser sergo albûma wêneyan a leşkerekî dîtin. Di albûma leşkerek ku li herêmê leşkerî kiriye de, wêneyên endamên PKK'ê yên înfazkirî cih digrin.Di sergoyê de wêneyên bi xwîn ên endamên PKK'ê ku di pevçûnan de jiyana xwe ji dest dayîn kişandine û xistine albûma xwe ya malbatê" (çavkanî:**DÎHA)**

Ji me re albûmeke xweşik çêkirine: Bi hovîtiya xwe ya nenaskirî ve, bi faşîzaniya xwe ya çiriyayî ve, bi qewl û peymanên xwe yên bêlomeyî ve, bi planên xwe yên gerînekî ve, bi neyartiya xwe ya barbarî û bêserûberî ve, vê albûmê neqişandine.

Bi kefşala devê xwe yê genî ve, bi xwîna xwe ya herimî ve, navê xwe û yên heft bavên xwe jî li ser vê albûmê danîne.

Xûşk û birayên me yên ku wekî çiyayên me xweşik yên ku dixwazin xewnên xwe li zozanên Kurdistanê bivejînin, yên ku dixwazin ji bermalên xwe re stareke henûnok ava bikin, dikevin ber xezeba wan û wekî gurên hov dixin vê albûmê...
Bila êdî çiyayên me bi têra dilê xwe bigirîn.
Zimanê me yê ku di kaniya Melayê Cizirî de dibû eşqa dilberê, yê ku di şîn û şahiyên me de mala rihê me yê herî mezin û xemrevîn bû, ji ber ku nehiştin biharek bi ser ve bê her weşiya û ket vê albûmê...

Êdî em wek lalan in gidînooo.
Çanda me ya ku di havînên xalxalokî de di nav hêviyên şivanan re bi stêrkan re hevaltî dikir ya ku li ber dîwarên neyaran jî her nefel dida, di bin nîrê wan de qurmiçî û ket vê albûmê...

Êdî havînên me bêriya stêrkan nakin.
Çîrokên me yên ku di nav awirên

diyên me de pala xwe her didan mereqa me, yên ku bi qehremanên xwe yî maqûl ve xwe di nav bexçeyên şevîngehên me de ji nû ve vedigotin, tevna wan xira kirin û xistin vê albûmê...

Êdî meşteleyên rihê me her ku diçe bêtir diçilmisin.
Stranên me yên ku ji hezkiriyên me re dibûn ramûsanên herî gulgulî, heyranok û payîzokên me yên ku Mem û Zînê di şevûrojekê de digihandin hev, ji nav me dizîn û xistin vê albûmê...

Êdi em li rastî Mem û Zînên kurdî nayên.
Leyîstikên me yên ku hîle û pîleyên zarokatiya me dipîvandin, yên ku şahidiya miziriyên ciwantiya me ya bê eman dikirin, bi leyîstikên xwe yên hov ve pelişandin û xistin vê albûmê...

Êdî em ji hev re leyîstikên neyarên xwe ava dikin.
Gund û çiyayên me yên ku wekî pirtûkên pîroz xwe di hembêza hev de vedişartin, deşt û zozanên me yên ku şervanan dikirin helbestvanê dilê xwe, ji cigareya xwe re kirin pizotê agir û xistin vê albûmê.

Yarî û tinazên me henek û pêkenokên me yên ku bi awaza tîqetîqên me ve her dem dibûn şekir û çequlatên feqîriya şevên me, rojekê serê xwe dan haziran û xistin vê albûmê.

Êdî em ji her demê bêtir feqîr û belengaz in.

Êdî em wekî miriyên bê serî diçin û tên.
Ji ber ku albûma hebûna me di destê wan de ye.

RÊBER

H. Reşîdiyan- Oslo

Li geliyê xan bûye nalîn
Li Ormiyê de bûye kalîn

Li her derê bûye eyan
Dim dim şiyar kirin ewan

Ev çi nalîn û kalîne
Dar û bera dihelîne

Jin rûniştine pişta dera
Rûçikandin tûka sera

Kîzan hêlan ebrî û poşî
Di qîrînyan biperoşî

Bûkan hêlan cilên sipî
Negrêdan ewan kofî

Xelk hemû bûne peroş
Ber bûyerê bûne reşpoş

Nalîn gehişte serê çiyan
Li nav mêrgan û kaniyan

Nûçe çûbû nav hevalan
Li ser çiya û zozanan

Ber bûyerê bûne bêdeng
Kul diçûn û bibûn bêreng

Neşên bigirên aşkere
Çunke biryara rêbere

Biryara rêber ew bû
Ji şehîdan giriyan nebû

Li batî giriyanê wan re
Berneden rêka wan re

Eve çibû hat serê me
Şehîd kirin rêberê me

Kanya avê me çik kirin
Bûyera berê dopat kirin

Doktor nav me de rakirin
Cihê wî nav gel vala kirin

Temenê xwe wî da ji dest
Ta gelê me bibe serbest

TÊGIHÊN FELSEFÎ

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Felsefe, pîvanga bikaranîna hizra mirov e. Her wiha pîvanga mêjera zanîna hizra mirov e jî. Çi têgih û rêman dibe bila bibe, heta ku xwe nespêrin şîroveyeke hişmendî û li gorî raveyeke zaneyane û felsefî neyên navandin, tu car nikarin bigihîjin wateyeke xwe ya rastîn. Ji bo wê hewce ye ku hemû têgih bi wateya xwe re li hev bin.

Di axaftin û bilêvkirina rojane de, mirov gelek caran pêrgî peyv û têgihên ku ji wateya xwe bi dûr ketine –an hatine bidûrxistin- dibe. Îcar ev têgih jî bi hin rengdêrên awarte ji hev û din têne veqetandin. Bo nimûne; gava behsa"demokrasî"yê tê kirin hin kes bê hemdê xwe dibêjin "demokrasiya rastîn". Di vir de peyv û têgeh bêhemd an jî dûrî ramîna mirov tê bikaranîn û navandin. Gava ku mirov baş bifikire, tenê wateyeke "demokrasî"yê" heye. Û dijwateya wê jî "otokrasî" ye. Belê dijwateya wê ne "demokrasiya ne rastîn e." Ango gava ku demokrasiya rastîn hebe, teqez dê ya ne rastîn (a sexte) jî hebe. Belê gava ku mirov ji hêla felsefî ve lê binihêre qet tiştekî wisa nîn e. Ji lewre demokrasî, xwediyê wateyeke misoger e. Û wateya wê ya rastîn jî tenê yek e. Yanî wateya demokrasiyê ya ne rastîn qet nîn e. Heke hebe jî ew ne wateya demokrasiyê ye.

Mirov dikare der barê vê yekê gelek mînakên şaş ên din jî bide: Wekî nimûne; "azadiya rastîn" û "azadiya ne rastîn", "bindestiya rastîn û "bindestiya ne rastîn", "têkoşîna rastîn" û "têkoşîna ne rastîn", "şoreşa rastîn" û şoreşa ne rastîn", "hevalê rastîn" û "hevalê ne rastîn", "dostê rastîn" û "dostê ne rastîn", "dijminê rastîn" û dijminê ne rastîn û hwd.

Hin têgih hene ku li gorî mêjer û pîvanga xwe têne ravekirin. Wekî mînak; "têkoşîneke xurt", "têkoşîneke qels"; "tevgereke xurt", "tevgereke qels"; "rêxistineke xurt", "rêxistineke qels", artêşeke xurt, "artêşeke qels" û hwd...Belê ev watedayîn ji bo têgihên ku wateya wan a misoger hatiye dayîn, ne derbasbar e. Lewre, pîvang û mêjera têgihên mîna "azadî","demorasî","bawerî", "şoreş", "sosyalîzm", "serxwebûn"ê û hwd. nîn e. Ew an bi wateya xwe ya misoger an jî bi dijwateya xwe ya misoger têne zanîn watedarkirin. Yanî mirov bi hêsanî dikare bibêje, "tevger" "rêxistin" û "têkoşîn"eke "baş" an jî "ne baş" belê mirov nikare bibêje "azadî", "demokrasî", "bawerî", "şoreş" û "sosyalîzm"eke "baş" an jî "ne baş"

Hin kes dibêjin: "Em ji bo azadiyeke rastîn têdikoşin." Gelo qey "azadiyeke ne rastîn" an ango "azadiyeke sexte" jî heye? Na. Lewre, têgiha "azadî "yê dijberê têgiha "bindestî"yê ye û pê watedar dibe. Bi vegotineke din di jiyana kes an jî civakekê de an azadî heye an jî bindestî. Girêdayê vê yekê mirovên wê civakê an azad an jî bindest in. Ne pêkan e ku him azad û him bindest bin. An jî hinekî azad û hinekî bindest bin. Belê pêkan e ku hin caran dilxweş û aram û hin caran jî diljar û xemgîn bin. Lewre "dilxweşî" û "xemgînî" du têgihên dijber, belê her wiha guherbar in jî. Û ew li gorî mêjera xwe diguherin. Lewre pêkan e ku mirov di heman rojê de him dilxweş û him jî xemgîn bibe. Belê de ne pêkan e ku di heman gavê him azad û him bindest bin. Mirovek, an azad e an jî bindest e. Bi heman awayî pergala rêveberiya civakekê jî an demokratîk e an jî ne demokratîk e. Îcar mirov ji bo pergalê nikare bibêje "hinekî demokratîk" an jî "zêde demokratîk" e.



Bi vegotineke vekirîtir, mirov bi hêsanî dikare têgihên ku wateya wan a rastîn bi awayekî misoger hatiye dayîn, rave û şîrove bike. Wekî mînak, mirov nikare ji bo "av" ê bibêje ava rastîn û "ava ne rastîn" an "kevirê rastîn" û "kevirê ne rastîn". Lewre tiştek an "av" e an jî "ne av" e. Ji bok kevir jî heman tişt derbas dibe; "an kevir" e an jî "ne kevir" e. Belê mirov nikare ji bo "başî", "nebaşî" , "xweşî", "nexweşî ", "rastî" û "ne rastî"yê heman tiştî bibêje. Çimkî pejirandina wate û şîroveya van têgihan li gorî kesan digihere. Tiştekî ku ji bo hin kesan baş be, dibe ku ji bo hin kesên din ne baş be. An jî tiştekî ku bi hin kesan xweşik û bedew be; dibe ku bi hin kesên din zist û kereh(ne xweşik) be**.** Belê têgihên ku wateya wan a rastîn û misoger ji hêla her kesî ve hatibe pejirandin û li gorî "rêbaza mantika formel" hatibe dayîn, nayên niqaşkirin.

Çi têgih û rêman dibe bila bibe, heke ku wateya wan î rastîn bi awayekî felsefî û zaneyane neyê danîn û ravekirin, dê pêwendiya navbera takekes û civakê biewiqe. Û girêdayî vê yekê jî dê ragihandin û têgihiştina navbera mirovan her gav kûd bimîne û bilicime.

Kaniya Helbestan

Letîf Epozdemir

PÊŞEWAZÎ

bende û dîlê zeman im
bijang wek tîr ebrû kewan
kezya berde ku bi reqsin
bisk û gulî bên himatê.

Şûr bi dest dijwar bi hestî
Bihara min neke zivistan
Dilovanî bê mirin e
Xwe dûr neke ji sebatê

Her carek ku sing diheje
Zelzele dikeve nav dil
Bi dîdarek sermest dibim
Derkeve nava civatê.

Ji hezaran dert re heye
Kûl û şehînek bo sebeb
Kirasê agir li me ye
Lewra dil nake tebatê.

Agirê zerdeşt bi nav im
Dişewite cerg û dil
Şev û rojan xew betal e
Naweste qet ji lebatê..

Meke gazin ey dîlbera gerden bi xal
Fesal tune nîne mecal
Wê bihar bê vebin kulîlk
Herkes kûbar bi felatê.

BÎRANÎN

ji bîr nabe ew rewşa kûbar
bê miraz man e îro cî û war
sed qeda li vê qedera dest bi dar
ku wiha me dihêle bê dost û yar.

Digel hev wek kela bûn
Ne hilwêşin bi derban
Bi dû hev ketin, çûn
Ken ma li ser lêvê wan.

Ey felek

te bi çavên birçî
jiyanê kiryê mîrat
mirin her para me ma
tarî bûne zilomat
bes êdî me navê
şîn û giryanê
vayê roja me hilat
me hezaran Nûredîn hene
hemû Yawûz dil polad

"ŞÎROVEYA DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ" DERKET

Piştî demeke dirêj dîwana helbestvanê navdar yê Kurd, **Melayê Cizîrî** bi şîroveya Kurmancî ji aliyê Enistîtuya Kurdî ya Stenbolê hate çap û weşandin.

Wêjeya klasîk a kurdî di nav kelepora zimane kurdî de cihekî taybet digire. Di nav wêjeya klasîk de jî çend nav hene ku berî her kesî têne bîra mirov. Ew kes xwediyê şahkar û berhemên bêhempa ne. Meleya Cizîrî yek ji wan navan e. Lê mixabin nifşên nû nikarin sûdê ji wan berhemên klasîk wergirin, ji ber ku di berhemên klasîk de zimanekî aloz û tijî peyvên erebî û farisî hatiye bikaranîn. Kesên ku van berheman bixwînin divê hem bi zimanê erebî û farisî bizanin, hem jî haya wan ji raman û felsefeyên wê demê hebe. Lê ji bilî kesên pispor kes nikare ji naveroka wan berheman fêm bike û çêjekê ji wan bigire.



Ji bo dagirtina vê valahiyê gelek kesan berhemên wêjekarên klasîk şîrove kirine. Dîwana Ehmedê Xanî, berhema Ehmedê Xanî ya bi nav û deng **Mem û Zîn** ji hêla gelek kesan ve hatine şîrovekirin. Her wiha Dîwana Melayê Cizîrî jî bi zimanên cur bi cur hatibû şîrovekirin. Di kurdî de jî Hejar Mukriyanî şîroveya wê bi zaravayê soranî kiribû, lê bi zaravayê kurmancî şîroveya wê nehatibû kirin. Seyda **Celalettîn Yoyler** ev valahî dagirt û hemû helbestên di dîwana Melayê Cizîrî de bi kurmancî şîrove kirin û di nav pirtûkekê de pêşkêşî gelê xwe kirin. Ev pirtûk ji nav Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê derket. Pirtûk ji 1087 rûpelan pêk tê, li ser kaxiza spî hatiye çapkirin û cilda wê jî çermîn e.

Di destpêka pirtûkê de pêşî li ser jînenîgariya Melayê Cizîrî agahî hatine dayîn, mijara jidayikbûna Melayê Cizîrî li gorî hesabê ebcedê hatiye ronîkirin. Wisa xuya dike ku dê hezkiriyên wêjeya kurdî karibin ji helbestên Melayê Cizîrê bi hêsanî fêm bikin û ji wan tam û çêjekê wergirin.

Nivîskarê "ŞÎROVEYA DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ", Celalettîn Yoyler

Em tevî pîrozbahiyên germ yên xebatkarê weşana **Agirî** ji Nivîskar **Celalettîn Yoyler** re bona encamdana vî karê mezin û pîroz, hêviya serkevtinê ji vî wêjevanê kurd û zehmetkêş bi hêvî dixwazin.

Jêder: Enistîtuya Kurdî ya Stenbolê

Bersiva Sudoku a Hejmara 42'an

9	2	4	7	3	5	6	8	1
1	8	6	9	2	4	3	7	5
3	7	5	8	6	1	4	9	2
8	1	3	6	4	9	5	2	7
5	9	7	2	8	3	1	6	4
4	6	2	5	1	7	8	3	9
6	5	1	3	7	2	9	4	8
7	3	9	4	5	8	2	1	6
2	4	8	1	9	6	7	5	3

Ji bo bersîvdana Xaçepirsa hejmaran (Sudoku)yê ya nû, tenê van sê xalên jêrîn berçav bigirin:

1. Hejmarên 1-9'ê di xet(xêz) û stûna serjêr tenê carekê dubare dibe.
2. Hejmarên 1-9'ê di xet(xêz) û stûna çeprast de tenê carekê dubare dibe.
3. Hejmarên 1-9'ê di nava çargoşeke 3×3 de tenê carekê dubare dibe.

Xaçepirsa Hejmaran (Sudoku)

		9	6	1	4	2		8
	6							3
7		4	3		2	9	1	
6		5	4				8	2
8				6	1		9	
4		7		2				1
1		8				4	6	9
		2	1	4		8	3	7
3	4		9		7	1	2	

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne
Agirî di ser înternetê:
http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php

Navnîşana derveyî welat: PDKI . C/O : A.F.K. 17, Avenue d'Italie
75013 PARIS – France

E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com

Civîna Parîsê Ya Welatên 5 + 1, Dosya Etomî Ya Îranê Bo Konseya Ewlekariyê Vegerand

Kongreya Çapemeniyê ya welatên 5+1 li Parîsê piştî bi dawî hatin civînê

Wezîrên Derve yên 5 welatên endamên dayîm ên Konseya Ewlekariyê û Almanya di necama civîna xwe ya Parîsê, di roja 12.07.2006'an de, biryar girtin dosya Etomî ya Îranê dubare ji Konseya Ewlekariya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî re bihê vegerandin.

Ev biryare ji ber vê çendê bû ku Îranê bersiveke eşkere û zelal neda welatên han û careke din wext û derfeta bersivdayîna derheq pêşniyarên hayder yên welatên 5+1 heya nîva vê mehê paş de xist.

Fîlîp Dost Bilazî, Wezîrê Karê Derve yê Frasanyê û berdevkê civîna Parîsê eyan kir, heke Îran bersiveke neyînî bide civaka navneteweyî, ew dê pêşniyarbiryarekê di Konseya Ewlekariyê de bînin ber bas ku ceza û dorpêçkirinên aborî dijî dewleta Îslamî ya Îranê werin meşandin.

Komara Îslamî dixwaze bi vê cure dîplomasiyê tenê demê bikire û bikuje, hetanî bikare bi qasê hewce Uraniyûmê bi dest bixe û çekên Etomî çê bike. Ev gava Îranê gef û xetereke mezin bo ser tenahî û aştiya cîhanê û herêmê ye. Ev rejîmê dixwaze civaka navneteweyî bixapîne.

Zanist û Teknolojî

"Adobê" Ew Kunên Ku Di "PDF Rader" De Heye Pero Dike

Hamid Durûdî

Du kunên gelek bizirar ku hetanî niha di "Adobe Acrobat" û "Adobe Reader"ê de bûn, hatine peydakirin û ji aliyê "Adobe"ê ku ev pirogeremane çê kirine, ji wan re çareserî hate peyda kirin. Lewra "Adobe" di peyamekê de nivîsandiye ku bikarînerên her du sîsteman yanî "Windows" û "Mac"ê bi sedema bikaranîna ev du pirogeremane, rastî pirsgirêkan hatine.

Rewşa herî xirab ya wan tûşbûnane demekê ye ku mirov rûpeleke "PDF"ê çê dike an ji bo vekirina wê hewcehî bi "Adobe Reader"ê hebe. Çunkî di wan demane de hinek rawestan pêk tê û li wir de jî ye ku kodeke bi ziyan bi awayê "buffert"ê çê dibe.

Divêt eva jî were gotin ku ev kunane di weşanên "6.04" û "6.05"ê de hene, lewra çêtir eva ye ev kesên ku weşanên 6.00 hetanî 6.04'ê bikar tînin, divêt hindî zû wan programan nû bikin, nexwe dikarin di malpera "Adobe"ê de weşanên nû dabigrin û di kompyoterê yan CD û hwd cih bikin.

"Microsoft" Tê Kurdistanê

Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo pêşketina navend û dezgehên Kurdistanê herdem di hewl û cehdê de ye û vê dawiyê hevhatinek tevî şîrketa "Microsoft"ê girê da. Di vê derheqê de Azad Geylanî, Ravêjkarê Serok Wezîrê Kurdistanê bo kar û barê peywendî û teknolojiyê got: "Proje pêk hatiye ji avakirina navendeke teknolojiyê di warê "Ict"yê ji aliyê Hikûmeta Kurdistanê û bi alîkariya şîrketa "Microsoft"ê li ser asta navendên giştî yên perwerde û fêrkirinê û beşa taybetî tevî piştgirîkirina zimanê Kurdî di berhemên "Microsoft"ê de."

Hêjayî gotinê ye ku şîrketa "Microsoft"ê yek ji kompanyayên mezin yên cîhanê di warê Kompyoterê de ye.

Daxuyaniyek Ji Hunermend

Şivan Perwer

Ji bo gelek tişt bi xeletî neyên fêhmkirin, ez mecbûr im vê daxuyaniyê agahdarî dost û guhdaran bikim.

Bi hunermend Gulistan re ji nêz a dûr ve danûstandin û têkiliyeke min a şexsî û hunerî nema ye û tune ye.

Zêdeyî 8 salan e em ji hev cida ne û hatine berdan. Ji ber vê yekê ye û hewce nake ku di warê jiyana taybetî de yan ji bo xebat û xizmeta hunerî destur û daxwazî ji şexsê min bête xwestin.

Hunermend Gulistan di jiyana xwe ya taybetî de azad û di danûstandin û têkilîyên xwe de bi biryar e.

Ez hêvîdar im ku dost, heval û guhdarên min li ser vê mijarê serwext û agahdar bin.

Şivan Perwer bi bahweriya gel û welat, bi hunera xwe herdem di xizmeta we de ye.

Rêz û aştî,

Şivan Perwer

Rêxistina Mafê Mirovan Li Kurdistanê:

Divêt Hukmê Bêparkirina Xwendekaran Betal Bibe

Ji bo kom û saziyên ewlekarî û dadê di zanîngehan de

Di heyamê wan çend rojên dawiyê de hejmarek ji çalakvanên xwendekar yên Kurd di zanîngehên Kurdistanê de ji domandina xwendinê hatine bêpar kirin yan tevî ceza û zext û givaşê ve berbirû bûne. Di encama destbiser kirina xwendekarek Kurd bi navê Yasir Gulî, du xwendekarên Kurd bi navê Aso Salih û Esed Baqirî her yek bi sal û nîvekê bêparî ji domandina xwendinê û çend xwendekarên din jî bi terzên din hatin mehkûm kirin.

Rêxistina Berevanî ji Mafê Mirovan li Kurdistanê tevî eyankirina xemgînî û nerazîbûna xwe ji van kiryar û hûkmane ji aliyê saziyên ewlekarî û dadê di cihên rewşenbîrî û zanîngehan de, gef û zextên li ser xwendekaran û bêparkirina wan ji domandina xwendinê, pêşgîrî ji çalakiyên çandî û medenî bi bêparkirina wan ji mafên welatîbûnê û dijî bend û yasayên navneteweyî yên mafê mirovan dide zanîn. Ev rêxistine xwazyarê vekirin û hilgirtina van biryar û hukmên li ser bêparkirin ji xwendin û kosp û asteng li pêşiya çalakiyên medenî a xwendekarên Kurd e.